HEMD BO XWEDÊ

Hemdê bê hed bo Xwedayê 'alemîn
Ew Xudayê daye me dînê mubîn

Em kirîne ummeta xeyr-ul beşer
Tabi'ê wî muqtedayê namiwer

Ew Xwedayê malikê mulkê 'ezîm
Daye me mîrasa Qur'ana kerîm

Dînê me kir kamil û ni'met temam
Ye'nî da me Ehmed û dar-us selam

Ew Xwedayê bê nezîr û zulcelal
Bê mîsal û bê heval û bê zewal

Raziqê bê dest û pa û mar û mûr
Alimê sirra negotî der sidûr

Karisazê bende û sultanê can
Rehîm û Rehman Latîf û Mihriban

Asîmanê bê stûn wî kir bedîd
Sûretê ba xal û xet wî aferîd

Hêvîdar în em ji te Şahê Kerîm
Îhdîna ya Reb sîrat-el musteqîm

Nê ji me sûc û xetatîn û sitem
Lê ji te îhsan û xufran û kerem

Ya Reb îmanê dixwazin em mudam
Jêrî alaya Muhemmed wes-selam

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

SELAT JI BO PÊXEMBER

Ber tû bada her zeman û an û hîn
Ey Muhemmed sed hezaran aferîn

Ey şefî'ê darûyê her 'illetê
Dîde û bînahiya vê ummetê

Destegîr û mustexasî herdu kewn
Bo gunehkaran penah û pişt û 'ewn

Sallî ya Rebbî ela xeyr-il beşer
Ta hebin teyr û bixûnin ber şecer

Ew hebîbê rohniya heft asîman
Herdu 'alem qalib ew rûh û rewan

Xakipayê Ehmed ew beyt-ul heram
Lew şerîf in zemzem û rukn û meqam

Sellî ya Rab'ela xeyr-il wera
Ma tesîr-uş-şemsû fî-seb'îl –'ula

Fexrê Îbrahîm û Îsmaîl û Nûh
Mustafayê ba wefayê ba futûh

Ma rameyte îz remeyte gûşidar
Destê wî destê Xweda der kar û bar

Sellî ya Rebbî 'ela xetm-îr rusûl
Ma yemûc-ul 'aşîqûne fis-subûl

Ew kelîmê xweş newayê çerxê tûr
Daxidar im bo wî sîmayê bi nûr

Ey şefî'ê sahibê alayê hemd
Min hene bê hed guneh nîsyan û 'emd

Lê me hêvî wasîqe dê ez feqîr
Jêrê alayê te bim roja 'esîr

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

XÊRA XWENDINA MEWLIDÊ

Herkesê guhdarê mewlûda nebî
Dergehê mizgîniyan dê lê vebî

Gote wî pêxemberê 'alî sifet:
"Mewlûda min herkesê mazin biket

Ez şefî'ê wî me roja mehşerê
Dê vexut ew tasek ava kewserê

Serfê mewlûda me yek dirhem fer e
Hemberê yek kohê zêrê ehmer e

Fîsebîlîllah bibexşî ber feqîr
Qedrê mewlûdê bizanin hûn kebîr"

Hem ji bo Bekr û 'Umer hat ev xeber
Hem ji 'Usman û Elî çêbûn eser

Dirhemek bit serfê mewlûda nebî
Xeyrekî mazin ji bo hasil dibî

Hem ji şeyxan bû rîwayet ev xeber
Şêxê Kerxî Fexrê Razî ba dîger

Herkesê hazir biket ew yek te'am
Ba bixûr û şerbet û qedrek temam

Gazî ket îxwan û hilbîtin çira
Bête xwendin mewlûda xeyr-il wera

Tête heşrê ew digel xelqê berê
Ye'nî ba peyxemberanê enwerê

Her çi bînit hindî tiştê xwarinê
Dê mubarek bit li ber vê xwendinê

Bête xwendin ger li yek sikke dirav
Dê mubarek bin dirahîm bêne zav

Bête xwendin ger li avê ê vexût
Rehme nazil cumleyê ‘illet dibit

Her cihê lê bête xwendin rehme lê
Dê melek bibrie tijî wê menzelê

Xaniyê lê bête xwendin ev sela
Dê bibîte ba’isê def’a bela

Bo xwendinê zadî û bo hemnişîn
Her selatan dê bidin kerrûbiyîn

Dafi’ê cumle hesûdî çav xirab
Der mezarê sehle lê redda cewab

Pur kesan dîtin keramat û eser
J’ xwendina mewlûda sultanê beşer

Her wekî hatiye gotin bê hîsab
Lê neşêm bêjim ji tetwîla kîtab

Qedrê mewlûdê nizanim bêjim ez
Lêk hişyarbin da nebîte cergebez

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

AFIRANDINA RONAHIYA PÊXEMBER

Girte yek qebze ji nûra xwe Xweda
Gotî wê: “Kûnî hebîbî Ehmeda”

Hêj ne erş û ferş û kursî û qelem
Hêj ne lewh û enbiyayê muhteşem

Saliha tesbîhe kir nûra şikerf
Şeş mîet elf û çihar û bîst û elf

Paşê bo wî çêkirin diwazde hîcab
Her yekî xweştir ji ya dî der hîsab

Qudret û te’zîm û minnet merhemet
Hem se’adet hem keramet menzîlet

Hem hîdayet hem nubûwwet rif’et e
Ta’at e yazde şefa’et temmet e

Her yekî westabû tê de çendi sal
Lê ’eded me s’pare ‘ilmê layezal

Her yekî tesbîhekî xas û cuda
Daîme tesbîhi xwendin bo Xuda

Paşê avête çihar behrê mezin
Wî Xwedayê layezal û îns û cin

Behrê nusret sanî behrê merheme
Behrê qudret behrê ‘irfan în heme

Çûn ji behrê me’rîfet ew hate der
Qetre jê werya bi îlham ev qeder

Sed hezar û hem çihar û bîst û elf
Her yekî bû yek Nebiyê dil şikerf

Paşî wî çêkir ji nûra namiwer
Cewherek lê kir nezer ew bû du ker

Nisfê ewwel dayî çavê heybetê
Nisfê sanî dayî çavê şefqetê

Nisfê ewwel bûye behr û her livî
Nê ji tirs û heybetê qet nanivî

Hem kelî ew behr û kef da û dûxan
Kef bûye erd û hem dûxan bû asîman

Nîveka dî çêkirin jê çari çîz
'Erş û kursî û qelem lewhê temîz

Hate emrê padîşahê layezel
Malîk-ul mulkê celîlê zulcelal

Ya qelem binvîs bi emrê padîşah
Ez çi binvîsim bi ferman ya îlah?

"Qale uktub la îlah îlla ene
Hem Muhemmed qasidê emrê min e"

Sacîd û bêheş girî sed salê dî
Ser hilîna got: îlahî seyyîdî

Ez dizanim la îlah îlla tu yî
Ew Muhemmed hemberî îsmek bûyî

Kîjke ya sultanê ba cûd û kerem
Padîşahê sermedî got ya qelem:

"Ger nebûya ew Muhemmed lewh û erş
Min ne tînane wucûdê ta bi ferş

Ney tu yî ney cennet û narê mezin
Cumle eşya min ji bo wî çêkirin

Muhbetê hingavt û şeq bû ew qelem
Ma li ser lewhê nivîsî dem bi dem

Serxweş û sekranê wî navê şirîn
Paşî ba îlhama Rebb-îl 'alemîn

Gotî ewwel: Ya Muhemmed es-selam
Hem 'eleyke goti Rebbê layenam

Da cewaben 'en hebîb-il 'izzetê
We 'eleyke es-selam û rehmetê

Bûye sunnet lew selam û redd û ferz
Cumle ehwal paşî hingî kirne 'erz

Wî nivîsî pêkve ummet qencikar
Cennetî û asiyan dê biçne nar

Ummeta Ehmed nivîsî ehlê nûr
Ummet-un muznîbet-un Rebb-un xefûr

Cumleyê ehwalê 'alem bîş û kem
Wî nivîsî bûrî û hişk bû qelem

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

AFIRANDINA ADEM PÊXEMBER

Çûn îradet hate sultanê refî'
Çêketin Adem bi vî şeklê bedî'

Emrê hate goşê Cîbrîlê emîn
Qebzeyê bîne ji beydayê zemîn

Ew dilê erdî û hem hûsn û beha
Zîneta meknûn û dûrra bê biha

Hati Cebraîl û ba emrê letîf
Çengekî axê ji wê qebrê şerîf

Girt û ba tasnîm û safî kir hevîr
Têkve da hetta ku ew qenc bû xemîr

Bû wekî dûrra spî wê saetê
Xewte da der cûyibarê cennetê

Emrê Cebraîlî kir paşê çûnan
Wî bigêre der zemîn û asûman

Berr û behr û şerq û xerbê alemî
Hate gêran hêj ne behsa Ademî

Nê hezaran sali çûne axerî
Ew nebî bû Adem hêj av û herî

Paşî hingî xaliqê her sûretê
Çêkirî Adem bi destê qûdretê

Pif kirî ruha xwe ew bû nazenîn
Lew melek hatin ji bo wî sacidîn

Bû xezîn e ew ji bo dûrra yetîm
Daniye pişta wî ew nûra 'ezîm

Paşê bir avête baxê cennetê
Xeyrî darê jê bixwe her nî'metê

Saf bi saf westane pişta wî gelek
Nazirê nûra Muhemmed ew melek

Gotî Adem: Ew melaîk bo çi her
Wî li pişta min dikin daîm nezer

Rebbê alem gote Adem ey mulî:
Tu ji bo nûra Muhemmed hamil î

Ew hebîbê min di pişta te zuhûr
Lew melek têne temaşayê ji dûr

Gotî Adem: Ey Xwedawendê felek
Min divêtin bêne pêş min ew melek

Hem bi fermana Xweda wê saetê
Nûr ji piştê hate nîva cebhetê

Hin dibêjin hate tilya şahidê
Lê heqîqet her dizanîtin Xwedê

Mislê rojê hatiye ew ca felek
Hem teheyyûr Adem û hindî melek

Gotî Adem: Ya rab ew nûra qebûl
Maye tiştek gotî eshabê resûl?

Gotî Adem: Ya îlahî qence bêt
Bête tilyan her çi maye min divêt

Nûra Bûbekrî diwastayê 'Umer
Di binser û 'Usman di xinser musteqer

Hate îbham dibên nûra Elî
Şu'le da tilyan û cennet mûnc'elî

Hati Hewwa û nezer da nûrê saf
Gotî ya Adem: Çi nûre pur şefaf

Gotî nûra yek nebiyê mezin e
Seyîd û hem serwerê nesla min e

Çûnkî bê emrî ji Adem bû zihar
Nûr ji enyê hate piştê bû sitar

Nê ji darê xwarin herdukan şirîn
Hûlleyê cennet ji bejnê da firîn

Îhbîtû mînha cemî'en hate emr
Adema dê bêteve lêkin bi sebr

Der Serendîbê bi erdê ket girî
Çendî salan rûhnikê wî bûn herî

Rohnikê wî şîn kirin dar û nebat
Çûn di erdê da û pa û mayî mat

Pir girî û xweş girî bê hed gelek
Newheyê înna zelemna çû felek

Rojekê ew der sûcudê bê mefer
Pir girî û hem li 'erşê kir nezer

Dît nivîsî la îlahe îlallah
Ba Muhemmed ya resûlullahê şah

Got: Bi heqqê an Muhemmed key te neqş
Wî kirî ba ismê xwe ber saqê 'erş

Tu bi xufran î min ê bêçare ah
Hati Cebraîl û ba emrê îlah

Ser hilîne Adema 'efwa Celîl
Bo te hat û rabe ey zîba cemîl

Hurmeta navê Muhemmed an resûl
Tewbeya te bû qebûl û her qebûl

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

NESEBA PÊXEMBER

Çûn ji Adem nûra Ehmed bû cuda
Hate pişta Şîsê burhan-ul huda

Hate eslab û bîtûnên tahire
Qet nebû yek jê xerab û facire

Fewqê 'Ednan ta ji Adem ixtilaf
Tê heye lew bê tifaqe ev mesaf

Jêrê 'Ednan ta bi Ebdullah gûhist
Bîst û yek bab in hemî rast û durist

Hin yekî 'Ednan û Me'd û hem Nezar
Mûdr û Îlyas in bizan ey goşidar

Mudrîke paşê Xûzeyme taze 'eyş
Hem Kenan e paşê Nedr e bû Qureyş

Malik û hem Fehr û Xalib hem Luey
Ke'b û Mûrre hem Kîlab û hem Qusey

Hem ji pişta wî Quseyyê pak û saf
Ew emanet hate nik Ebdulmenaf

Hem ji nik Ebdulmenaf ew muxtefî
Hate pişta Haşim ew nûra sefî

Hem ji Haşim bû emanet munqelib
Hate bû mêhvanê Ebdulmuttelib

Silsila wî ta bi Adem da û bab
Pêkve dê biçne beheştê bê hîsab

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

BÛNA 'EBDULLAH Û GEHEŞTINA RONAHIYÊ BO WÎ

Hem ji Abdulmuttelîb bû hamile
Fatime hem mûddeteş bû kamile

Jê bû 'Ebdullah bi hukmê sabîqe
Nûra Ehmed der cebîneş barîqe

Mezherê nûra Muhemmed hate ew
Pak û nûranî mueyyed hate ew

Cubbeyê Yehya di Şamê da nûmin
Sûfekê sipî bû hemî têkda bixwin

Girt û xûnê cûbbeyê Yehya çû nar
Wê demê bû yek şehîdê bê şiwar

Hişk bû ew xûn û bûrîn rûzîgar
Ta wicûdê 'Ebdullahê namîdar

Taze bû ew xûn û mercan bûne rêz
Rahiban got ay û way exbarê nêz

Wextê rabit Ehmedê 'alî 'elem
Nasixê tewrat û încîl û senem

Hat xudanê seyf û Qur'ana mûbîn
Xûnê Yehya bû nîşana wî yeqîn

Lêk vegêran hem sûal û hem cewab
Way û weyla kefte nav ehlê kîtab

Wan yeqîn kir 'Ebdullah hate wicûd
Ba 'edawet qest kirin qetla wî zûd

Ehlê kizb û ehlê zûr û îftira
Çen caran hatine Umm-ûl Qura

'Ebdullah der hifzê sultanê wedûd
Nûra Ehmed dafi'ê şerrê yehûd

'Ebdullah mazin bû ba naz û delal
Canê 'Ebdulmuttelib ew mah û sal

Xweş divê babê 'ezîzê maderî
Rohniya malê û zîba esmerî

Şikl û sîma mislê bedra asiman
Nazik û rana û nûra xanedan

Dilber û mehbûb û şîrîn û wek şeker
Herkesî ew dît û dil lê bû duker

Dohtê çakanê Qureyş û hem 'ereb
Muntezir bûn pêkve bo wî roz û şeb

Her yekî hîvî dikir ew bît qebûl
Ba yekî wî qet neda meyla wisûl

Bûd û azad ew ji fikra în û an
Yûmnê nûra Ehmedî bû pasîban

Rojekê wî gote babê: Ey emîr
Sa'eta ez biçme bethayê beşîr

Min ji piştê tête der nûrek mezin
Radibîtê ser serê min ew ji min

Ez dibînim munqesim bûye duker
Yek di şerqê yek di xerbê çûye der

Têteve çespan û çapûk bê di reng
Tête ser yek mislî hewrê taze reng

Ez dibînim asîman bûye du şeq
Radibît ew nur û ta heftim tebeq

Têteve fil-hal zan 'alî meqam
Ez dibînim tête pişta min temam

Sa'eta rûnim li ser mehda zemîn
Min ecaib tête pêşim aferîn

Hem ji erdê tête sem'im ev kelam
Wî di gel te nûra Ehmed wes-selam

Her çi darê hişk û ez çûme binî
Bû hişîn û kesk ji belgan pir xenî

Bû sih û seywan li ser min nagîhan
Ez ku çûm bû hişk û bê belk û xusan

Ev çi remz û hal e babo bêje min
Goti babê: Rohniya çavê di min

Şabe mizgîn im li te ey nazenîn
Dê ji te zahir bitin şahê emîn

Hêviya min wasiqe dê rabitin
Ehmedê mursel ji te peyda bitin

Eşrefê mexlûq û sultanê cîhan
Dê ji te peyda bîtin bê şek bi zan

Min dî der xwab û mame muntezer
Ehmed ez puşta te ye canê peder

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

BERGERYANA CIHÛYAN DA ‘EBDULLAHÎ BIKUJIN

Çûnkî Ebdillahî rabû pak-î zat
Nê li qetla wî cuhûdan kir xebat

Rahib û ehbar û hem ehlê kîtab
J’agirê kerbê hemî bûne kebab

Hatine heftê cihûd ez mulkê şam
Taze beyêt best û ‘ehdana temam

Cengî û merdê dilawer şîrê gîr
Pêkve xwarin sûnd û bestin tîr û şîr

Ta neyêtê kuştin ew zîba heram
Yek ji me nayêtê ax û milkê Şam

Rahê sehra girt ewanê kîne dûz
Mislê kundê her bi şeb çûne bi rûz

Zû gihiştin çûne dora Mekkehê
Ketne posan mislî ava bin kehê

Ta bibînin kengî bibîtin firsetê
Nobedar ketne kenarê hîşetê

Rojekê wan dî bi çolê de meşî
Talibê nêçîr û ahûyê xweşî

Wan ku di rabûrî ‘Ebdullah çûnan
Ba tenê tenha bi çolê de rewan

Firseta xwe dîn û rabûn şîr û hesûn
Çûn pey da mislê gurgê dev bi xûn

Hem di wê rojê li seydê bû weheb
Yanî babê Amîne 'alî neseb

Çûn seda hat û weheb lê kir nezer
Hate 'Ebdillah qewmê xûnceger

Revde gurgê hate berxê nû ciwan
Lêbelê hişyar e lê zîba şivan

Nagîhan fikrî weheb dî ji asîman
Hate xwarê leşkerê rûhaniyan

Xeybeyan keske pûşê gul'ûzar
Hatin ew jêk rakirin jê tar û mar

Terfetûl 'eynî cuhûd berbad kirin
Wan ji iqlîmê cîhan winda kirin

Sa'eta sirrê ji xeybê dî weheb
Mayî heyran û vemayî der 'eceb

Çun ji 'Ebdullahî dît ew sirr û hal
Xweş li lewhê dil nivîsî ew xeyal

Ger qebûl ket daye wî min Amîne
Pak û me'sûm e êfîf e mûqîn e

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

ZEWACA 'EBDULLAHÎ Û AMÎNEYÊ

Paşî wê sirra ezîmê nûrê tab
Nazilê qelbê weheb bû izdirab

Çapûk û çespan vegerya hate mal
Wî hîkayet kir ji bo mala xwe hal

Hem hîkayet kir ji bo zewcê weheb
Hem keramet hem ji cenga bil-eceb

Gote zewcê: Qenc e qasit bêje min
Rabe çîne xanedana dil mezin

Bêje 'Ebdulmuttelib: Min Amîne
Wê li nik zîba 'efîfe mûqîne

Ger ji 'Ebdullahî bîtin ew qebûl
Temşiyet dê bêt û çêbît ew wusûl

Nazik û sîma xweş dilber ew e
Layiqa wî babeta wî her ew e

Hate 'Ebdulmuttelib kir ba xeber
Hem di 'Ebdullahî hubbê kir eser

Gote dayê: Rabe ey zîba xesal
Zewceyê bo min bixwaze bes delal

Ba cemal û ba kemal û ba edeb
Xweş eda şîrîn lîqa 'alî neseb

Zû dirabû Fatîme dil şadiman
Nazire ber sûretê gulçehrekan

Pir şepal û gulruxan û taze 'eyş
Sakînanê perdeyê alê Qureyş

Dil newa û pêkve naz û qend-i leb
Kes nedî şîrîntir ez binta weheb

Amîne gul bû di gulzarê cemal
Husnê û bê hed qed û qamet î'tîdal

Dê çi bêjim ez cemal û me'rîfet
Walida Ehmed bes e her ew sifet

Fatîme dît û vegerya damina
Gote Ebdullahî behsa Emîna

Mislê wê nabin şepal û nazenîn
Nê di dunya ne di Firdewsa berîn

Cardî ço dît û ew nazik nîhal
Lê vexorin babet in herdu heval

Hate 'Ebdulmuttelîb rakir ji mal
Çûn ji babê xwest ew re'na delal

Weqiyek zîv weqiyek hem zeheb
Sed şutûr sed pez ewî dane weheb

Sed beqer cumle ciwan û samine
Bû hinarin pêkve nextê Amîne

Hat 'Ebdulmuttelib vê sa'etê
Kir tedarek kar û barê dawetê

Çêkirin zad û te'amê bil-eceb
Hem Qureyşî xwendin û hindî 'Ereb

Emîna xemilî ji rengê gulşenê
Zend û bazin reştine ji rengê xenê

Xweş newa û xweş eda hatin 'Ereb
Cum'e bû ew şeb nehî mahê Receb

Wê şevê anîn nîkah û 'eqd-i best
Bûk û zava mane şerbet daye dest

Der Mekke meşhûr bû ew gotine
Ebdullah zava ye bûk e Amîne

Hesret û kerbê hemî berbad kirin
Wê şevê sed jin temamî jê mirin

Bûk û zava herdu çûne xelwetê
Şahiyane kefte baxê cennetê

Zûdi Ridwanî vekir babê cunan
Daketin dergehê nîran nagehan

Hûr û xilman û çem û teyr û nebat
Hatine hemd û senayê xweş lûxat

Ez demî can bexşî Cibrîlê Emîn
Mujde da ehlê semawat û zemîn

Cebraîl hate dewra Ehmedî
Hat şahê mislê wî çavan nedî

Rabê mizgînê bibe ji mexlûqî ra
Ji asîman û erd û ta tehte-s sera

Xulxule peyda bû der heft asîman
Sewtê tesbîhê melek çû lamekan

Hate xwarê Cebraîl û mujde da
Kesk-i ala yek li banê Ke'be da

Mujde da mexlûq hayê behr û ber
Cumle heywanat zanî ew xeber

Xweş nîda hat ez yesar û meymene
Nûrê Ehmed hat çû nik Amîne

Hat nûranî *şefî'ul muznîbîn*
Hat xeyr-ûn-nasê xetmul murs'elîn

Wê şevê hindî senem bûn sernugûn
Textê Îblîsê le'în bû wajigûn

Lew li ser sûret revî teşbîhî mar
Hate gohê bo Qubeysê kir hewar

Zuryeta wî cumle hatin bê newa
Ew çi hal e bêje me? wî gote wa:

Lew li min çê bûye tirs û zelzele
Ba Muhemmed Amîna bû hamîle

Hat dewra Ehmedî dewra me çu
Lat û 'Uzza dê bikat bê ab-i rû

Yek ji me êdî neşêtin bit 'eyan
Wî li me rê girt ji çûna asiman

Hat xûnrêzê cîhangîr û sefak
Em ji destê wî hemî dê bin helak

Roniya herdu cîhan û millatan
Ummeta wî çêtirînê ummetan

Dê çi bit halê me û tedbîr û ray
Ay û way û ay û way û ay û way

Hem di subha wê şeva dewlet fuzûn
Textê şahanê cîhan bû sernixûn

Bê tekellum ma devê hindî milûk
Şah eger hakim eger mîrê bilûk

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

GIRANIYA AMÎNEYÊ BI PÊXEMBER

Amîne gote şeş meh çûne ser
Min ji hemla xwe nedî qet yek eser

Paşî şeş meh hate min awazê xeyb
Min li te mizgînî ey pakîze ceyb

Wî digel te xatemê peyxemberan
Nasixê herfa kîtab û defteran

Lê di xewnê de me dîtin bê 'eded
Enbiya û remz û nîşan û sened

Ewwela min dî ji min nûrek diçî
Qesrê Bûrsa min ji 'eksa wî didî

Mahê ewwel hat û Adem teyyîba
Kir selam û gote hemlî merheba

Mahê sanî hat Şîs ez meymene
Gote min mizgînî li te ya Amîne

Mahê salis hat Îdrîsê nebî
Kir selam û mujde ber hemlê te bî

Mahê rabi' Nûh û xamis Hûd û hem
Hatin û mizgînî da min pir kerem

Mahê sadis hat Îbrahîm Xelîl
Da min mizgînî ji wî hemlê cemîl

Mahê sabi' hat Îsma'îl zebîh
Mujde bexşî ji wî hemlê m'elîh

Mahê samin hat Mûsa ba wefa
Îbşîrî ya Amîne bil Mistefa

Mahê tasi' hat Îsa ji asiman
Mujde da min hat sultanê cîhan

Ew ku şeş meh çûn ji hemlê mûnqelîb
Gote Ebdullahî Ebdulmuttelîb

Ba ticaret dê biçî ta semtê Şam
Ez Medîne bar bikî temr û te'am

Wê demê dê Amîna kodek bibî
Yek ziyafet lazim e de'wet hebî

Ebdullah an mahê rûyê gul'îzar
Der Medîne şerbeta mergê wexwar

'Umrê Ebdullahî bîst û pênc û sal
Bûrî û kir wî ji dunya îrtîhal

Çûn ji Ebdulmuttelib ew waqî'e
Herdu çavê Amîne bun damî'e

Kan habîbê min dilê min bû du nîm
Ah û hesret kodekê min ma yetîm

Esmerê min ma ji xelkê karîwan
Hatine peyda ne ew rûh û rewan

Dar û ber bo wê girîn wê sa'etê
Ab û rûhnik nedenê qet muhletê

Hem melek rabûn û gotin ya Kerîm
Nê hebîbê te Muhemmed ma yetîm

Malîkul Mulkê mezîn da ew cewab
Çêtir im bo wî ji xeyra da û bab

Ey xudawendanê ‘eqlê musteqîm
Kes nizanit qiymeta durra yetîm

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi ‘eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

BÛNA PÊXEMBER

Ez rebî-‘ul ewwela şev rewşen e
Heştî şev borîn li hemla Amîne

Ya nehê zail jê tirs û ‘ena
Ya dehê bû mujdeder xîf û mina

Yanzde hem bû xulxule awaz û hem
Zemzema tesbîhê der hindî herem

Dazde hem hilbû şemala dewletê
Amîna mabû tenê der xelwetê

Wê şevê der Ke’bê ‘Ebdulmuttelîb
Mabû ber te’mîra ‘erdê munqelîb

Amîne got: Mam tenê bê mêr û jin
Ez demek tirsam û lerzî hate min

Min dî xanî rohnî bû xayet belê
Çarî jin hatin ji riknê menzelê

Ba cemal û husn û nûranî qemer
Hulleyê îstebreq û sundus di ber

Le’lîha têr ew ji ava kewserê
Zulfeha sed te’ne dane ‘enberê

Bejn û bala ser û sîmayê şefaf
Min şubhandin tuxmeyê ‘Ebdulmenaf

Yek li destê rastê hat û yek li çep
Yek li piştî û yek li pêşem ba edeb

Ew kî bûn? Hewwa û Sara Asiye
Yek li pêşim Meryema 'Îmranî ye

Meryemê husn û melahet zêde bû
Palveda bû ew ji bo min tekye bû

Nagihan bû zemzem û tesbîh û deng
Ba lûxethayê muxalif reng û reng

Rast û çep min dî kewakip têk firîn
Qaf-i ta qafê cîhan bû enwerîn

Pêkve dinya min didî bû qursê nûr
Meşriq û mexrib didîtin min ji dûr

Kesk-i alayek di mexreb da mi dî
Yek li şerqê yek li banê Ke'be dî

Emrê Cebraîlî kir mîrê mezin
Mujde da ehlê semawatan û zemîn

Daketin dergahê nîran nagehan
Şahiyane hûr û ridwanê cûnan

Xulxulîn horî di qesrê cennetê
Kî dizanî kar û barê qudretê

Hat-i Cîbrîl û melaîk fewci fewc
Çar kenarê Mekkehê bûn mewci mewc

Nagehan ez têhnî bûm wê sa'etê
Min dî da destê min camek şerbetê

Sipî wek şîr û şêrîn wek 'esel
Nê ji wê şîr û 'esel bûye mesel

Min wexwar û têhnî çû *filhal* ji min
Teyrekî sipî hat û perê malî di min

Wî demî min bû Muhemmed Mistefa
Nurê can û me'dena sidq û sefa

Çûn ji min bû wî û sultanê derîn
Xerqê nûr bû ev semawat û zemîn

Herçî mexlûq pêkve bûne şadiman
Xem di çûn 'alem ji nûr ve dîte can

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

Cumle zeratê cîhan da ev nîda
Kirne gazî pêkve gotin merheba

Merheba ey sirrê furqan merheba
Merheba dermanê derdan merheba

Merheba ey canê baqî merheba
Merheba 'uşşaqê saqî merheba

Merheba ey 'alî sultan merheba
Merheba ey kanê 'irfan merheba

Merheba ey şemsê taban merheba
Merheba ey canê canan merheba

Merheba ey qurret-ul 'eynê xelîl
Merheba ey xasê mehbûbê celîl

Merheba ey rehmete-lil 'alemîn
Merheba ente şefî-'ul muznîbîn

Merheba ey afîtabê bê zewal
Merheba ey mah-i tabê layezal

Merheba ey bulbulê baxê wîsal
Merheba ey aşînayê zul-celal

Merheba ey nûrê xurşîdê Xuda
Merheba ey tu ji heq nabî cuda

Merheba ey geşteyê behra heqîq
Merheba ey dîdeyê ehlê terîq

Merheba ey sahibê ceyş û heşem
Merheba ey kasirê Lat û sanem

Merheba ey sahibê seyf û xeza
Merheba ey mani'ê Lat û 'Uza

Merheba ey metlûbê 'alem her tu yî
Merheba ewladê Haşim her tu yî

Merheba ey nûrê Heq ra mezher î
Merheba ey ewliya ra serwerî

Merheba hati şivanê ummetê
Merheba hat bo me nûra dewletê

Merheba ey bedrê 'alem ya munîr
Merheba xelqê ketî ra destegîr

Merheba sultanê cumle enbiya
Merheba ey nurê çeşmê esfiya

Merheba ey iftixarê enbiya
Merheba ey şem'ê cem'ê ewliya

Merheba ey menbe'ê 'ezez û wefa
Merheba ey kanê eltafê 'eta

Merhebe ey nûrê çeşmê ummetê
Merheba ey sun'ê şahê qudretê

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

EW TIŞTÊN LI ŞEVA BÛNÊ ÇÊBÛNE

Secde bir her wî demî an nûrê can
Dest hilînandin bi sûyê asiman

Pareyê 'ewrek sipî ez asiman
Hat û hilgirt û ji min xaib bi wan

Hateve medhûn û pêçayê kehîl
Pare 'ewrek di gehiştê bo delîl

Girt û bir lê hate guh min ew xeber
Girt û wî dunya seraser behr û ber

Hateve sipîpare ermîşek di gel
Wê mijî ba le'l û wek şehd û 'esel

Lêbelê xoş hate goşem ev nîda
Pêkve zanî xelqehayê enbiya

Min dî xanî bû ji teyran reng û reng
Dim ji zumrûdan û hem yaqûtî çeng

Paşê hatin sê nefer lê her yekî
Husnê sûret mislî qursa rojekî

Yek di destê wî mesîne yêkî teşt
Yekî anî cameyê sipî ez beheşt

Heft caran şuşt û pêçan pir huner
Gotî her sê rabûne û çûne der

Naêne hedd û hisabê mu'cizat
Muxteser min gotine ne't û sifat

Dê çi bêjim ne'tê zatê enwerî
Ê ku 'alem cumle bo wî çêkirî

Mun'ekes bûn wê şevê hindî senem
Agirê faris vemirya bû 'edem

Taze eywan xaneyê Nûşîrewan
Rast û çep hejya û lerzî nagehan

Şev bû kûn kir çarde rê jê çûne der
Xewf û tirsek hate Kîsra bê mefer

Behrê Sawe çik bû û hişk bû nihan
Wadiya nav lê Semawe bû rewan

Ez serê hindî mulûkan tac-i ket
Zêde bû lê tirs û fikr û zelzelet

Der duşembê dazdehê ewwel rebî'
Salê fîlî hat ew hemlê bedî'

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

EW NÎŞANÊN 'EBDULMUTTELIB DI WÊ ROJÊ DE DÎTIN

Rabû 'Ebdulmuttelib tîkel seher
Got: Me dî zemzem kete ruknê hecer

Ke'be çû secde mubarek bû meqam
Rukn û ban û beyt û lêkdu kir selam

Rukneha *Ellahû Ekber* jê dihat
Hat mizgîniya Muhemmed es-selat

Pak bû ez Lat û 'Uzza û senem
Hat Ebul-Qasim şehrê 'alî 'elem

Rast û çep xwoş hate zîba erxenûn
Nê Muhemmed hat û bût bûn sernixûn

Hatin îbrîq û legen misk û gulav
Ke'be şûştin mame heyranê tewaf

Ez bi derkeftim ji babê Şeybe zûd
Min Sefa û Merwe dîtin der sucûd

Belgê dar û ber ji feyda *la yemût*
Caena Ehmed Resûllullah digot

Hat awazek eya mezinê Qureyş
Ev çi tirs û lerze ye ey teybi 'eyş

Rabû 'Ebdulmuttelib xoş hate mal
Teyrekê mazin li banî çeng û bal

Bêhna Firdewsê ji hucra Amîne
Hat û der hingaft û got: Ya sakîne

Amîne hat û ewî jê kir sual
Kanê ew nûra di gel te ey şepal?

Amînê bo gotî mewlûda mezin
Hatifî navê Muhemmed gote min

Wê di xewnê da diye nûra mûbîn
Ger divêtin tu bibînî dê bibîn

Refte 'Ebdulmuttelip bo dîtinê
Şîr di desti nagehan yek rehzenê

Ne'reyê zed hate 'Ebdulmuttelib
Heybetê girt û dilê wî murte'ib

Nabitin dîtin heta sê roj temam
Ta melek bêne tewafê xas û 'am

Hat Ebdulmuttelib pê xweş biten
Bê tekellum maye ezman û dehen

Paşî çendî dît ew nûra sebî
Rohniya çavê di bapîrê xwe bî

Amînê şîr da dehanê şekkerîn
Ta gehiştî weqtê teslîma deyîn

Amîne got: Min di xewnê da diye
Murdî'e dê bit Helîma Se'dî ye

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hîn bibêjin es-selat

HATINA HELÎMA SE'DÎ BO MEKKEHÊ Û BIRINA PÊXEMBER

Mekkiyan kûdek didane şîr-idar
Da di germê da nebin kûdek nezar

Hem qebîla Se'diyan diger bilûk
Her dihatin ta Mekkeh telbê biçûk

Wê qebîla Se'diye lê bû xela
Mêr û jin pêkve ji birsa mubtela

Got Helîmê: Rojekê em çend heval
Bo giyayî çûne nava yek newal

Hem giya jî tê hebû hem ava sar
Min giya xwar û ji avê hem vexwar

Hem hevalan jî giya û av vexwar
Hat awazek xudanê nadiyar

Ha niha biçine Mekkeh ey cumle jin
Da mubarek bin ji mewlûda mezin

Xûrrem ey zîba deyîn bo xwe bibet
Xweziya pustanê ku şîr jê bi xwet

Tirs xalib bû li me hatîne mal
Gote min Haris: Çi hale ey heval?

Min ji bo wî got ewî got: Ey hebîb
Belkî ev mewlûd ji bo me bit nesîb

Nagihan min dî di xewnê da yekî
Ez birim avêtime rûbarekî

Sipî wekî şîr û şirîn şehd-i war
Jê vexwo! wî gote min sê çar car

Ez ji xew rabû me ve têr û tijî
Herdu pustanê di min şîr jê rijî

Sahiban ez dîtim û pursîn dirêj
Lêk tenebbuh bû li min bû kes mebêj

Yek xerê laxer hebû lê pûr kesad
Haris anî taze kurtan lê nehad

Karwan rabû bi qesda Mekkete
Bûm siwar û hem li ber min Zemrete

Dore dora karwanê leng û lûk
Ker ji çûnê bo û Haris ma xudûk

Gote min: Wer da biçîn bê zehmetê
Min di gotê hat nûra dewletê

Da biçîne pêşî ûcaxa Qureyş
Belke halê me bibîtin taze 'eyş

Min dî yek merdê tewîlê enwerî
Ba serê rim wî îşaret da kerî

Ya Helîme isri'î mizgîn li te
Tu dayînî bo Muhemmed xwezî te

Tîz çû ew xweş kerê laxer miyan
Wî berahî bir ji hindî karwan

Ewwela min kir li bethayê nezer
Çar teref pêkve giya û laleter

Karwan danî li cayê teyb û 'eyş
Jin hemî geryan li eşrafê Qureyş

Gote 'Ebdulmuttelib xweş Amînê:
Nê divêtin bo Muhemmed dayînê

Qale hazel emri minh qet beda
Hate goşê min ji hatif ew nîda

Sufuwe er Rehmanî xeyrûl murselîn
Nîne ez xeyrî Helîme ew diyîn

Hate nik Amînê jin ba surûr
Her çi zanî ew yetîme çûye dûr

Yê xweşî zîba yetîmê şîr xwer
Herdu 'alem jêrî ferman ser bi ser

Yê xweş ew re'na yetîmê şîr cû
Nûrê herdu alem ji ruxsarê û

Ey Helîma hilgire an pakê zat
Dewletê baqî û daîm bo te hat

Hat Helîma gote 'Ebdulmuttelib
Halê salê halê qehta muzderib

Hatime bo yek puser ez bim dayîn
Ger li nik te dê hebî ni'mel emîn

Gotê Ebdulmuttelib: Namet çî ye?
Gotî: Navê min Helîma Se'dî ye

Gotê Ebdulmuttelib: Xwoş mehdî tu
Hem bi husn û hem bi hilm û Se'dî tu

Wê li nik min nûrê çeşm û qûtê can
Mislê wî ney bûne û nabin der zeman

Lê yetîme durre bê misle me hey
Ez cihê babê me ger dê tu bi bey

Gote Ebdulmuttelib da ez biçim
Bêjime zewcê xwe pirsê pê bikim

Hat û gote Haris: Ey zîba xitab
Ya Helîme weyhekê wî da cewab

Dê çikey tu ba yetîmê bê peder
Ya Helîma damena sebrê biger

Hate çûnê karwan û kir cihêz
Dîte Haris ruhnikê wê bûne rêz

Harisî got: Ez dibînim tu xudûk
Got: Heqqa! Dê biçim ez bê biçûk

Gotê: Han bîne ewî tiflê yetîm
Qet tewekkelna 'elellahî el Kerîm

Xweş vegerya pêşî 'Ebdulmuttelib
Hatime durdaneyê te ey muhîb

Da biçîne pêşî dayê aminîn
Min ku dî ew husn û dîdara şirîn

Yêk regem xwalî nema ji muhbetê
Bo me yexsîra ewî wê sa'etê

Xweş dema hilgirt kenî bê hed gelek
Nûrê xwende lahiqê çerxa felek

Bûse damin herdu çavê enwerîn
Xweş mijî ba herdu lêvê şekkerîn

Rast vexwar û dev neda sediyê çepê
Hişt ji bo zemrey bi Îlhama Xwedê

Weqtê çûnê hat 'Ebdulmuttelib
Da me zad û tişt û min go ya muhib

Min bese ew kûdekê nûrîn cemal
Dewlemend im dê çikem ba tişt û mal

Xwestî xatir min ji cedd û Amine
Aminê hilgirt ew nazik tene

Dabû ber bêhna xwe rûhnik bûne çem
Wa Muhemmed tu biçî ez dê çikem

Dûriya te sohtî qelbê Amîne
Lê çikem ev şole ne bi destê min e

Ey hebîbê min Muhemmed ey delal
Bêje da rûhnik ne barin bote al

Tu bike ferwar da sebr û sukûn
Bo me bêtin werne can û dil me çûn

Tu emanetê Xudê bî ey ciger
Ey Helîme fî emanîllah bi ber

Bir Helîma bo xwe ew durra yetîm
Xweş bi te dayîne ya Se'd û Helîm

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

ZIVIRÎNA KARWANÊ SE'DIYAN JI MEKKEHÊ

Subhê rabûn karwanê Se'diyan
Ew kerê laxer ji bo wan hersiyan

Haris anî û Helîme lê siwar
Paxila rastê Muhemmed tê veşar

Ya çepê danîbû tê da Zemrete
Ker sivik çû çapûk û bê zehmete

Ewwela çû Ke'be sê car secde ber
Saniyen ew hate çûnê pur huner

Dî kusan ew ker nebî çûn xweş çeleng
Wê li pişta wî sowarê neh felek

Ew kerê laxer dê pêşî karwan
Wek siha teyrî li deştê bû rewan

Se'diyan gotin: Helîme ey heval
Ew kerê laxer me go naçîte mal

Vî demî sê lê siwar in mislê teyr
Wê diçîtin nagehîte kes bi seyr

Ker bi ezman hat û gote Se'diyan
Qet 'eceb nîn e ji çûna min 'eyan

Wê li pişta min Resûlê Rebbê 'erş
Jêrî destê wî ji 'erşî ta bi ferş

Seyyîdê mexlûqê Rebbûl 'alemîn
Çêtirînê ewwelîn û axerîn

Qewmê Se'dî pêkve gotin ew meqal
Nîne ew qewl û seda îlla xiyal

Mislê bayî keftîne rê her bixar
Dane ser yek kûr û deşt û kohê sar

Gotî ezmanê Helîme ev beyan:
Em bi dûr keftin ji xelqê karwan

Min dî sakin erbe'ûne rahiban
Tabi'e isqûfekê eswed qeban

Wî di gote rahiban wesfa hebîb
Weqte rabitin Muhemmed 'en qerîb

Kasirê esnam û qettalê cuhûd
Bê 'eded nîşanê wî hatine wicûd

Ez ji wan borîm û çendînê gelek
Şu'leyê nûra Muhemmed çû felek

Weh heware, got isqûfê kebîr
Hê eve wernê û jêk rakin bi şîr

Dest didan şîran û hatin şubhî san
Xweş li pey me mulhidanê bê eman

Dê çikem ya Reb meded mîrê mezin
Wa Muhemmed rohniya çavê di min

Hate nêzîkî me koma rahiban
Min Muhemmed dî nezer da asiman

Hate xwarê agirê mislê şehab
Têk weratin sotin ew ehlê 'ezab

Hatifî gota ji yûmna şehsiwar
Ûhlîkûl kuffar min naril qehhar

Karwan hat û hemî em çûne mal
Pêkve pê xweş bû nîsa û hem rical

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

PÊXEMBER LI NAV ÛCAXA SE'DIYAN

Dewleta baqî gehişta Se'diyan
Rizq û ni'met hatine bê tehliyan

Dexl û dan û ga û pez lê zêde bûn
Hem cefa û mehnet û alam çûn

Pêkve hatin dest û pê lê bûse dan
Muhbeta wî kefte qelbê cumlekan

Hem Helîme xerqê în'am û kerem
Wê Ebul Qasim li malê bo çî xem?

Gotî: *Wellahîl 'ezîm* ew nazdar
Hat û min came ne şûştin qet tu car

Tahir û pakîze paqij her me dî
Bewl û xaît min ji 'ewret qet nedî

Bû du salî û xiraman sû bi sû
Têkilî le'ba biçûkan qet nebû

Rojeka wî heftiya yek kûdekî
Haftiya wî mah û mah ba salekî

Ewwelê lefza wî min maye li bîr
Gotî wî: *Allahû ekber min kebîr*

Sala sê nazik nihal û rûh û can
Arezû kir wî şivanî nagehan

Hem bi hukmê karê ummetperwerî
Bû şivan û laiqî pêxemberî

Rojekê wî gote mader: Ew bira
Kanê? Min gotê: Pezê birye çera

Gotî: Qet insafe dayê ez li mal
Ew li germê ez vexûm ava zelal

Gote wî min: Dayê me bispêre Xudê
Min tewekkul wî hem tu bidê

Subhê min dayê 'esa û zad û hem
Bû şivan û herdu çûne ber xenem

Ey şivanê ber reyê burca bere
Jêrî gopalê te alem yek sere

Ba terehhum pez çerîn ez can û dil
Rehmê tu ber cumle alem muştemil

Ey şivanê kûdeka zîba delêr
Xwezya wî berxê ji dîdara te têr

Weqtê êvarî şevan dê bête mal
Ez di çûme pêşî zîbayê delal

Gote min: Dayê! Me go: Hatim *îleyk*
Ey Muhemmed *sellemellahû 'eleyk*

Zemre hat û gote min xweş ev cewab
Min ji wî dîne 'ecaib bê hisab

Pa nehid ber xuşk keskûn bû temam
Her çî ew dît dar û ber lêkir selam

Bêjîte pez: Dê here, ew dê biçî
Wer neçe, naçit û sakin multecî

Rojekê pez bû belavê wadiyê
Min vegeryandin ji tirsa 'adiyê

Gote min: Bo çî tu nahêlî dilêr
Pez biçî? Min go: Cihê qeyxane şêr

La texef wî gote min pez çû çere
Nagehanê hate me yek qeswere

Wî Muhemmed dît û dûvê xwe hijand
'Aşiqane hate pêş û ser nihand

Girte goşî gotinê yek du mesel
Min ne fehmê wî çi gotin kir digel

Şêr ku rabû êdî çû qet kes nedî
Pez çerî xweş rahet û kefte qedî

Anî yek pez min şikênand dest hêj
Hate pêş û destê xwe wî kir dirêj

Destê an pez girt û malî ba delal
Wî demî rabû bezî mislê xezal

Weqtê zuhrê rojekê bê kar û bar
Zemre çapuk hat û gazî: hey hewar!

Cûte merdûm bo Muhemmed hat û bir
Ez nizanim bo birayê min çikir

Wa Muhemmed got û rabûn mêr û jin
Gotî Haris: Ey Helîma way li min

Hate kuştin der xerîbê berkê 'eyş
Ez çi bêjim pêşî salarê Qureyş

Pêkve rabûn xas û 'amê Se'diyan
Lê Helîma zû gehiştê an zeman

Gotî: min dî der tebessûm le'lê şûr
Jê di çû çerxê felek estûne nûr

Bûse da min herdu çavên surmeyî
Ew çi bû hate hebîbê min tu yî

Gote min: hatin du merdê ba cemal
Şeklê nûranî ji nûra la yezal

Destê min girtin revam îname îr
Dana me erdî û der deste gîr

Sîneyê min wî du kerkir ta binav
Jê derîna qelb û ehşayim tewaf

Wan bi destê xwe dilim teqlîb kir
Nuqteyê eswed derîna jê vekir

Gote min: ev behreyê dêwê le'în
Min ji te avêt ey şahê emîn

Êdî anî yek mesîn û yek legen
Şûşt nerm û pak û nazik bê mehen

Wî demî danîne cî qelb û ceger
Mohrekê mazin ji nûrê hate der

Mohreyê kir qelb û cayê bûye şeq
Hate ser yek ew bi emrê mîrê Heq

Rakirim danîme cih bê zehmetî
Got bikêşe ba dehan ji ummetî

Ba dehan kêşan ez bûme giran
Got: Bi kêşa ba hezaran her wisan

Hate kêşan û me rakir ew hizar
Got wî nûrî cibahê gul'izar:

Ger bikêşî ba cemî'î ummetê
Di girantir bî ji nûra rehmetê

Herdukan ez dame ber bêhna xwe saf
Herdu çeşman û serê min kir tewaf

Mislê berqa xatifa rabûn û çûn
Min didîtin ta li çerxê berzebûn

Got: Helîme ew beyan û ew meqal
Min ewî hilgirt û em hatine mal

Qewmê Se'dî gote min: Çi sakin î?
Rabe hilgir wî bibe nik kahinî

Min bire nik kahinî ev qisse got
Kahinî hilgirt û da ber sîne got:

Uqtilûha hazel xulam min digel
Werne di batil biket dînê Hubel

Nagehan min dît yek merdê mezin
Rim li kahin da libasê wî kefin

Qewmê kahin bûn helak ew jî herê
Min Muhemmed anî û hatim li rê

Min dî yek jin ba girîn û şîn û ah
Ber kenarê bîr û ber serxakê rah.

Wey li min! Min yek puser bû canê pak
Çû di bîrê de û axer bû helak

Min Muhemmed anî û min gotê: Wer
Mu'cize ger te hene dê bîne der

Wî îşaret kir bi tilya nûrîn bav
Av bi serkeft û puser ber rûyê av

Ew ji avê hate der rabû qiyam
Gotî an dem: Ya Muhemmed es-selam

Hat awazek te'eccub nîne ger
Ew ji bîrê kûdekan bînîte der

Ew te'eccub bû ku ew çawan siwar
Dê xelasket van gunehkaran ji nar

Paşî ez çûme serî û herdu çav
Lê reşandin 'enber û misk û gulav

Hat dengê hatifî ya Mekkehe
Yê ji te hatî belê wê hate te

Ketme karî wî demî ez dem bi dem
Amîne pir jê xerîbe da bibem

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

ZIVIRÎNA PÊXEMBER BI MEKKEHÊ

Ew ker anî bû Helîma bû siwar
Hem li ber sîne hebîbê namidar

Ro bi Ke'be hat û ew bê tirs û bîm
Ew kerê çûn xoş me dî hate hetîm

Hate goşî an Helîma ev newa
Xoş nîdayê can fedayê ez hewa

Ey hetîm û ey herem pak û temîz
Bo te hate bejin û balayê 'ezîz

Hat sultanê felek jêrî ne'al
Hat cananê du 'alem 'eksê hal

Hat mehbûbê du sed Yûsif xulam
Hat muxtarê ku 'erş û ferş ram

Hat bo te ey mekkeh weqtê surûr
Sed hezaran nûrê sîmayê bi nûr

Nê tu bûyî menzîla rûhaniyan
Ta qiyamet rukbedarê haciyan

Rast û çep fekrî Helîma kes nedî
Wê di gêriya ṭeheyyûr da xwe dî

Her peya pey hat awazek şirîn
Mustefa wê daniyande ser zemîn

Da biçîtin telbe ket kanê kî ye
Xweş dibêjî vî newayê 'aliye

Kes nediyet û hateve ew haderî
Mustefa lê berze bû berda girî

Deng hilînand wê li banê koçikan
Ah ah! Durdaneyê min kê revan?

Mekkiyan gotin: Me hajê nîne qet
Wê verêhtên av û rûhnik bûne şet

Pîremêrek hate pêş û ba 'esa
Ey Helîma ew çi hal e bo Xuda

Min ji bo wî got hal û renc û ah
Gote min: Werda biçîne pêşî şah

Ez birim ta pêşî 'Uzzayê sanem
Gote min: Ew xeybzane pir kerem

Nê hezaran berze wî peydakirin
Mislê te bê çare wî şadan kirin

Secde bir pîrî gotî: Ey senem
Ev Helîme hatiye pêşîte hem

Kûdekê wê der Mekkeh wenda bû lê
Ismê an kûdek Muhemmed bû belê

Wî Muhemmed gote, 'Uzzayê senem
Ser nişîvî hate secdê gote hem

Tu here ey pîr ew çi gotin e
Ew Muhemmed hat nê 'ezla min e

Sernixûn û şermezar in em ji wî
Hem kesad û bê 'eyar în em ji wî

Ew zeman borî ku em tê xwoş bibîn
Baregaha wî gehişt û em revîn

Rabe ey pîrê hewayî hat roj
Bes bi navê wî dilê min tu bisoj

Nê ji navê wî dilerzin asiman
Hem ji hubba wî kelîne behr û kan

Heybetê xweş girte pîrê rih sipî
Wî 'esa avêt û lerzî mislê bî

Lê Helîma gote pîrê hişetê
Gerçi ez keftime behra hîretê

Yêk demê ba wî li min we'zê diket
Yêk demê sekinî bi min rehmê dibet

Kûdekê min wê revayî xeybiyan
Xeybiyanê keske poşê asiman

Ez ji kê nalim ji kê gazinde kem
Her çi ew bêjîte min ez dê we kem

Gohtina xeybê îcazet min ne bû
Lew dibêjim: Ehmedê min berze bû

Ger bibêjim hal û esrarê derûn
Dê bibêjin: Dîn û sewdaye cunûn

Gote wê pîrî: Helîma vê bike
Hemdê Rebbanî û hem şukrê bike

Haşe lîllah ew Muhemmed berze bî
Belkî 'alem dê di wî da berze bî

Bo Muhemmed her zeman û her mekan
Sed hezaran nobedaran pasiban

Zanî 'Ebdulmuttelib ew waqi'e
Av û rûhnik çûn ji cavan dami'e

Hat ber dergahê Ke'be ew bi soz
Ey Helîmê sirrê ey danayê roz

Tu muyesser ke cemala wî yetîm
Dîtina asar û ihsana kerîm

Na şubhete me eger çi ku ji me ye
Kîmyayê fedl û Îhsana te ye

Tu bi heqqê fedl û îhsana 'ezîm
Bêje min ehwalê wî tiflê yetîm

Nagehanî hat awazek letîf
Ha niha biçne tuhameyê şerîf

Wê li bin dara yemamî û xemam
Bûye seywan wê di keffa wî mudam

Pir diket tesbîh û der kef munqelib
Rabû çû telba wî 'Ebdulmuttelib

Çû ku rûniştî li bin dara yemam
Qale: Men ente eya şêrîn xulam?

Got: Ey namem ji min pirsî bi lez
Ez Muhemmed îbnî 'Ebdullah me ez

Gotê: Ez ceddê te me ey rûh û can
Ey hebîbê min 'ezîzê xanedan

Dabû ber sîne siwar kir hate mal
Hate malê taze ew nûra zelal

Aminê çav bûne rewşen wesselam
Hem ji mewlûda nebî temmel kelam

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

PAŞGOTIN

Ehmeda çavê te *ma zaxel beser*
Yek îşarata te *înşeqqel qemer*

Hukmê tu carî ji 'erşî ta bi ferş
Ê ji nûra te munnewwer ta bi 'erş

Ateşê Mûsa çi bû? Ruxsarê tu
Weddûha nûra dilê hişyarê tu

Dûr ji nûra te diyayê mehr û mah
Lî me'ellahîl celîl baregah

Nê ji ne'leyna te ey durra yetîm
Fexr û teşrîfe ji bo 'erşê 'ezîm

Herdu 'alem çi? Siha 'iqbalê tu
Sûndê *welleyl* bi zulf û xalê tu

Hem tu rûh û hem rewan û can û dil
Pêşî bejna te siha gul bû xecil

Can fedayê bejn û balayê te bim
Mest û sergerdanê sîmayê te bim

Şehriyarê çêtirê 'ewrayê tu
Xet şeq bû ber felek tuxrayê tu

Şehsiwarê duldulê kewn û mekan
Wasilê wehdet serayê *la mekan*

Min hebin sê sed hezar ezman û dev
Yek demî xafil nemînim roz û şev

Wesfê husna te bêjim subh û şam
Sed qiyamet di biçin hêj na temam

Ya Resûlellah! Resûlê ins û cin
Ya şefî'ê sedrê dîwana/eywana mezin

Tu şefa'et ke ji bo me 'asiyan
Wer me nefsa şûme naket qenciyan

Ya kerîmû ya îlahel 'alemîn
Yar rehîmû ya 'ezîmû ya metîn

Hîvîdarê rehm û ihsana teyîn
Talibê îkram û xufrana teyîn

Hadirê guhdarê mewlûda resûl
Hîviya me tu bikî ya Reb qebûl

Nê tu xeffarî û settarê 'uyûb
Me bibexşînî bi xufranê zunûb

Hem li da û babê hindî mu'minîn
Hem li hindî mumînatan ecme'în

Tabi'ê an şehsiwarê ummetê
Pêkve rabîn û biçîne cennetê

Ewwela bo rewzeyê nûrîn niqab
Saniya bo al û ezwac û sehab

Salîsa bo enbiya û murs'elîn
Rabî'a bo ewliya û mu'minîn

Hem ji bo huccac û xuzzatan temam
Hem ji bo vê meclisa sahib te'am

Hem ji bo her çar îmamê caddeyê
Hem ji bo na katibê vê nusxeyê

Bo cemî'î muslimîn û salihe
Bo feqîrê Bateyî el-Fatihe

Ger divêtin hûn ji narî bin necat
Bi 'eşq û şewqek hûn bibêjin es-selat

DAWÎ

exres lal
exter stêr
eyal malbat, aîle
eyisîn/teyisîn çirisîn, biriqîn
eylan mar
ezmanbirrî bêdeng, bêsewt
'eden bihişt, cennet.
'endelîb bilbil
'eqreb dûbişk.
'er'er dara hevristê
'esel hingivîn
farix vala
ferş kevirê pan û berfireh, mecazen ji bo dinê
fetilîn zîvirîn
fikurîn, fikirîn
gelwaz benî, meşlûl
genc xezîne
gengaz mimkun, pêkan
geztin devlêkirin, gezkirin
gîsû kezî, guliyê por
gorişman hevdîtinan
goş guh
goşîdar guhdêr
gulbav gula bi xunav
gulnîgar gulsifet
gulpîrehen kiras bi gul
gunbed kumbet, qube
hemail cureyek nivîştan
henzel petîşok, zebeşê ebû cehl
heykirin saxkirin
hîcab perde
hilm dilovanî
hingaftin destdan, lêxistin
hingur êvar, mexrib
hudhud çûkê suleyman
hulle xişir
hullepoş kesê ku xişir bi xwe vekiriye
hurrem xweşik

'illet nexweşî
'işwekar nazdar
înan anîn
îxwan pirjimariya bira
kebed kezeb, cerg, mêlak
kele sûr
keleber kuç, keleya wêran
kenişte perestgeha cihuyan, hewra
kesb ked, xebat
kewkeb stêrk
keywan gerstêrka saturnê
kizb derew
koh çiya
kohsare çiyayî, cihê çiya
kolik xaniyê biçûk, holik
kozî çeper, kûz
kuçik, argûn, tifik
kudek zarok, gedek
kulav kepene, tatî
kunkirin qulkirin
kusa çawa
le'l kevirekî giranbuha û sor e, ji bo lêva yarê tê bi kar anîn
lebit lêva te
lewleb çerxa ku li ser bîrê pê av derdixistin, mecazen ji bo çerxa felekê tê gotin
lexav gem
lîwa' ala, beyreq
me'den kan
me'yûs bêhêvî
mecrûh birîndar
mehd dergûş
mehweş mîna hîvê
mêlak kezeb, ceger
mencel qazana mezin
metleb daxwaz
mexleb pencê teyran
mîsaq peyman
mişextî *penaber, sirgûn*

mu'erref *diyarkirî*
mudam herdem
muddeteş dema wê
mûn qels, temah
munîs hogir
muqteda serwer, serdar, pêşîvan
mureccem recimbûyî
muretteb rêzkirî, nijinandî, bi tertîb
mursel hinartî
musemmat navlêkirî
mutrik terkkirî
muxnî amûrekî muzîkê ye
muznib gunehkar
namiwer navdar
ne'ilet ne'letî, ne'letlêbûyî
ne'leyn cotên solê
ne't pesin, medh
nedîm heval
nehcûr hicretbûyî
neolîtîk serdema kevirîn
neqt dirav, pere
netrik xişreke zînetê ye
newhe qîr û gazî
newm razan
nexasim nemaze, bi taybetî, baxusûs
nezîf pak, paqij
nîgar sûret, neqş
nigûnser serberjêr, sernişîv
nijde êrîş
nîlgûn şîn,
nîran agir
nivîn/nivîstin razan
noşmendî vexwarinî
paspan zêrevan, nobedar
penah star, piştgirî
pengiyan tijîbûn
perçem temerî
pertew tîroj, tîrêj

perû xelat
perwazî firîn
pêvenûsk pênûs, qelem
piderwar bavikwar
pustan paxil, pêsîr
qamet bejn û bal
qelûçk qalikê hişk
qesar cil spî
qol bende
qultebanî gulyabanî
qulzem behra sor
qurmiz sor
re'na xweşik
rehnuma rênîşander, rêber
rehzen rêbir, rêjen.
rejû rijik, komira dara ya şewitî
rekbehacî heciyê siwar
remîm riziyayî
renc êş û azar
rewan giyan, ruh
rikêb alava ku pêlî dikin û li hespê siwar dibin
ru'yet dîtin
sazende çêker
sefwet safîtî, paqijî
sekînet aramî, rehetî
sekran sermest, serxweş
selatîn pirjimariya sultan e
serengûn keftî, dernişîvkirî
sergeşte sergêj, serdoj
seyf şûr
seywan xeleka roniyê ya dora hîvê, tiştê siyê dide. 2. sîwan
sî qaz
silhatin xeyidîn
sîmaperî rûperî
sivlaq navê mehabadê yê kevn
solîn kanî, avzên
spîndar hewr
star hewîngeh

sûf hirî
sufalîn axa ku hatiye sotin û tiştên mîna cêra jê çêdibe.
şaneşîn cihê rûniştina şahan, şahnişîn.
şefeqse'dê yara ku şewqa wê wekî stêrka bext e
şefî' mehdervan
şehsiwar şahê siwara
şem' mûm, find
şemal meşale, çira
şepal şêra mê
şêt dîn, dîwane
şeyda gêjatî, jiheşçûyîn
şikuften bişkivîn
şimşîr şûr
şol kar, xebat
şor peyv, xeber
şu'le çirûsk
şubih mîna
şûkirin mêrkirin
şûnwar êwirgeh, cihê mayinê
tawusxeram a ku meşa wê wekî tawis bi naz
tehisî zeliqî,
tehtessera bin axê
temed wek, qandî
tenem çermê min
term laşê mirî
tertîf terbît
tesnîm kaniyeke avê ye li bihiştê
tetwîl direjkirin
tewcîh berê-xwe-dayîn
tewlîd rojbûn, wîladet
tezelzul hejiyan, zelzele
tifil zarok
tîn herî
tîra seqîf
tîz xoş, bi lez û bez
tûba navê darek cennetê
tuxra mohra padişahan
tuyûr pirjimariya çûkê
vewestin rawestîn, sekinîn
we mam weha mam, wisa mam.
wîtir fer
xakipa axa bin pê
xeberbezîn yê/ya paşgotiniyê dike
xebîr haydar, agahdar
xeclan şermkirî, fedîkirî
xedeng cureyekî tîr
xef veşartî
xelel şêlû
xelqet afirîn
xemmas fesad
xemr mey
xemz naz
xeraman meşa bi naz û fexr
xeryrulbeşer qenctrînê mirovan
xezra kesk
xilwa xelwet, tenêtî
xilxal xişreke ku jinan bi nigê xwe vedikirin
xinapenc dest bi hene
xired eqil, heş
xirên zingîn
xizmetguzar xizmetkar
xûb xweşik, bedew
xubrû rûxweşik
xudûk melûl, xemgîn
xunce gula nebişkivî
xuroş coş, fûrîn
xusan belg, pel
xusran ziyan, xisar
xwab xew
zebad maddeyeke bêhnxweş
zeban ziman
zenexdan kortika çeneyê
zerbih bihoka zer
zîba xweşik
zulfeyn herdu biskên yarê
zumerred kevirekî giranbuha

RESIM



Qebra Melayê Bateyî



Gundê Batê



Kavilên Xaniyê Melayê Bateyî



Kaniya ku Melayê Bateyî li ser nimêj dikir



Dîrhe



Akarê Gundê Batê

M. Xalid Sadînî li ser qebra Melayê Bateyî



Gundê Batê



Lûleyên Tivinga
Melayê Bateyî

Alavên
Bateyî



Mela Salihê Qewalî (Bateyî)





Mela Emînê Pîrûsî